# Sûrîye | SYRIA

TIER 1 | USCIRF-RECOMMENDED COUNTRY OF PARTICULAR CONCERN (CPC)

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya Dewletên Yekbûyî (USCIRF), encûmeneke azad û hikûmeteke cotpartîyî ya federal e ku çavdêrîyê li ser azadîya dînî û bawerîya li derveyê welêt dike û li gora Qanûnê Azadîyên Dînî yê Navneteweyî (IRFA)yê 1998ê hatiye avakirin. USCIRF, ji bo çavdêrîya azadîyên dînî yan li derveyê welêt binpêkirinên bawerîyê standardên navneteweyî bi kar tîne û şîretên sîyasetê li Serekî, li Wezîrê Karên Derve û li Kongreyê dike. USCIRF avabûneke azad e û ji Wezîrîya Karên Derve cihê û biferq e. Rapora Salanî ya Çalakîyê ya 2017ê, zîrweya karên ji alîyê endamên Encumenê û mensûbên karî ve ya di seransera salekê de hatiye çêkirin e û neqenc bikaranînê bibelge dike û ji hikûmeta Dewletên Yekbûyî (US) re pêşnîyarîyên siyasetê pêşkêş dike û nişanî wê dide. Rapora Çalakîyê ya 2017ê ya Salanî, ji dewreya sala salnameyî ya 2016ê û Sebata 2017ê pêk tê, lêbelê di hindek rewşan de behsa bûyerên giring ên piştî vê navberê jî tê kirin. Ji bo zanyarîya bêtir a li ser USCIRFê, ji vê derê rûpela înternetê bibînin yan jî bi rêya jimara têlefona 202-786-0611ê bi USCIRFê re yekser têkilî bikin.

## Sûrîye

**Bidestketîyên Hîmî:** Rewşên azadîya dînî yên li Sûrîyeyê, her ku şerê navxweyî xerabtir dibe di seransera 2016ê de hinbihin xerabtir bû û şerê li dijî Dewleta Îslamîya Îraqê û Şamê (DAÎŞ) dewam kir. Komên dînî yên li Sûrîyeyê, rejima Serek Beşar Esedî, nêzîkî 100 komên dijber ên çekdar, komên wek DAÎŞê û wek Cebhetul Fethul Şama endama Elqa’îdeyê ku ji alîyê Dewletên Yekbûyî (US) ve wek terorîst hatine xuyandin jî di nav wan de ji alîyê kirdeyên cûrbicûr ve bi zordestîya azadîya dînî re rûbirû man. Ji alîyê rejima serek Beşar Esedî û yekbûyîyên Îran û Rûsyayê ve hedefkirina bi zanîn û bêyî cudahîyê bimbebarankirina cîhên di destê ‘Erebên Sinnî de, tingijîna di nava ‘Erebên Sinnî û Fileh, ‘Elewî, Şî’î û Durzîyan de heyî, bêtir kir. Digel ku hikûmet gotibû wê di sala 2014ê de stokên çekan teslîm kiriye jî, Neteweyên Yekbûyî (UN), Esedî, ji ber bikaranîna çekên kîmyayî li herêmên rikber li wan hene, gunehkar dît. Di vê gavê de, bi desteka Hêzên Sûrîyeya Demokratîk (SDF) a ku ji alî koalîsyona bi serdarîya Dewletên Yekbûyî ya li dijî DAÎŞÊ tê destekbûyîn û bi desteka hikûmeta Tirkîyeyê jî Mertala Feratê, bajarên Bakurê Sûrîyeyê Minbîc û Cerablûsê ji DAÎŞa ku her kesê ku îdeologîya wan qebûl nake ji xwe re dikin hedef û axa wan bi hêza hovanî bi rê ve dibin bi paş ve stand. Şervanên komên dijber ên çekdar, tevlî girêdayînebûna bi hîç siyaseteka yekbûyî, êrîşên mezhebî pêk anîn. USCIRF, ji ber bizavên hevkar ên rejima Esedî, hêmanên dijberîya çekdar û komên terorîst ên ji alîyê Dewleta Yekbûyî (US) ve hatiye xuyandin, di 2017ê de li gora Qanûnê Azadîyên Dînî yê Navneteweyî (IRFA), wekî ku ji 2014ê ve tesbît kiriye, careke din îsbat kiriye ku ew layîqê “welatên hêmanê endîşeya taybet” yan CPCê ye. Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya Dewletên Yekbûyî (USCIRF) ji bilî van, di 2017ê de tesbît kiriye ku DAÎŞ, di Çileyê Pêşîn ê 2016ê de, di çarçoveya guhartinên ji bo binpêkirinên azadîya dînî de, binavkirina wek “avahîya hêmana endîşeya taybet” feyde dîtiye.

**Pêşnîyarîyên ji Hikûmeta Dewletên Yekbûyî (US) re**

• Di çarçoveya Qanûnê Azadîyên Dînî yê Navneteweyî (IRFA)yê de Sûrîyeyê wek CPC (welatên hêmanê endîşeya taybet) bidin xuyandin;

• Di çarçoveya guherandinên ji bo DAÎŞÊ yên di Çileyê Pêşîn ê 2016ê de DAÎŞê wek “jêdera xuyandî ya endîşeyê” bidin xuyandin.

• Zordarîya zalimane ya rejima el-Esedî û sûcên li dijî mirovahîyê yên li dijî Mislimanên Sinnî û yên din, tawanbar bikin û gelên din jî ji bo kirina heman tevgerê teşwîq bikin;

• Biryarên Encumena Ewlehîya Neteweyên Yekbûyî (UN) yên bi jimarên 2118ê (ya gazîkirina tunekirina çekên kîmyayî yên li Sûrîyeyê), 2139ê (gazîkirina ji bo gihana mirovahî ji bo herêmên dorpêçkirî û bidawîhatina bimbeyên varîlan), 2165ê (tesdîqkirina gihana mirovahî ji bo xetên şerî), 2209ê gazîkirina ji bo bidawîanîna bikaranîna bimbeyên klorînê û 2254ê (rawestandina şerî û li Sûrîyeyê ji bo lihevhatina xerîteya rêyê) jî di nav de ji Encumena Ewlehîyê ya Neteweyên Yekbûyî (UN) û dewletên endam re; biryarên tesdîqkirî bi hûrbijarî pêk bînin û tevgera li gora mijarê teşwîq bikin,

• Li dû nimûneyên Sûdanê û Lîbyayê, li Mehkemeya Cezayê ya Navdewletî (ICC) ji bo destpêkirina lêpirsînê li ser sûcên rejima Esedî, bi awayekî daîmî gazî bikin;

• Ji bo lêkolîna binpêkirinên ku DAÎŞê  li Îraqê û Sûrîyeyê li ser kêmanîyên dînî û nîjadî kirine, şîreteka gazîkirinê li Encumena Ewlehîyê ya Neteweyên Yekbûyî (UN) ya ji ICCê re were şandin bikin yan jî destekê bidinê;

• Di kombûnên navneteweyî de li dijî DAÎŞê bi wêrekkirina Yekîtîya Gerdûnî, bi bêtirkirina alîkarîyên mirovahî yên herî bilez û karkirina li ser pêşîktîya li welatê sisêyê, bicîhkirina kêmanîyên dînî û nîjadî yên herî bêparastin û bipêşvebirina tedbîrên ji bo pêkanîna alîkarîyê teşwîq bikin û piştî bidawîhatina şerî li welatên malxwe ji bo kesên ji vegera mala xwe hîvîdar in, desteka demdirêj peyde bikin;

• Tê bikoşin ku wisa were nirxandin ku pîlanê hikûmeta Dewletên Yekbûyî ji bo Sûrîyeya piştî şerî û mijarên bi azadîya dînî û mafên mirovan re têkildar bizaveke ji bo “hemîyê hikûmetê” ye û bi awayekî guncaw bi USCIRFê û bi pisporên hikûmeta Dewletên Yekbûyî bişêwirin;

• Hem li welatên cîran (nexasim Libnan, Urdun, Misr û Tirkîye) ên ku multecî hewandine û hem di dema amadekarîyên ji bo Sûrîyeya piştî şerî de; ji bo fînansekirin û bipêşvebirina bernameyên xurtkirina xweşbînîya di nav dîn û nîjadan de sivikkirina tengijînên mezhebî û bêtirkirina qedr û qîymetê heqên têkildar û Têkoşîna bi DAÎŞê re di nava dezgehên pêwendîdar ên Milletên Yekbûyî yên di nava Yekbûna Gerdûnî de, dezgehên civata sivîl û nîvekarên bi heman fikran re têkoşîneke hevpar bidin destpêkirin;

• Li Dewletên Yekbûyî Bicîhkirina multecîyên Sûrîyeyê dewam bikin – ji bo alîkarîya Sûrîyeyîyên pirxeter, li ser binyata lêkolîna ewlehîyê û hesasîyê daxwaza pêşîktîyê-, di bizavên têkoşînên krîza mirovahî ya awarte de serektîya Dewletên Yekbûyî nîşan bidin, û destekê bidin hikûmetên li Rojhilata Navîn ên bi milyonan Sûrîyeyî hewandine; û

• Bêyî pêveberdana ewlehîya neteweyî, ji bo ji nûve bicîhbûnê, wisa bikin ku serîlêdanên multecîyan zû-zûka bi cîh werin û ji bo kontrolên piştperdeyî, jêdera têr bidin Beşa Ewlehîya Neteweyî ya ku ew ji nû ve bicîhbûnê bi hûrbijarî lêkolînên kesî bi rê ve dibin.

Divê Kongresa Dewletên Yekbûyî (US) van tiştan bike:

• Ji bo salên malî yên heyî û yên pêş, li qanûnê veqetandinê yê Dewletên Yekbûyî divê madeyek bê zêdekirin ku hikûmeta Dewletên Yekbûyî, dê ji bo tunekirina nîjadî, sûcên li dijî mirovahîyê, yan jî ji bo alîkarîya bi lêkolîn û çavdêrîya li ser sûcên şerî yên li ICCê keysa veqetandina jêderên divên yan peydekirina keysa veqetandinê û li gora feydeyên neteweyî alîkarîya bi wan re madeyek lê were zêdekirin.

**Pişta Perdeyê**

Ji dema ku Hafiz el-Esed di sala 1963ê de bi pênc sûbayan re derbeyê da destpêkirin û di 1971ê de xwe wek serekê Sûrîyeyê bijart, malbata Esedî, bêtirî pêncî salan Sûrîyeyê bi rê ve biriye. Piştî mirina wî, di Temûza 2000ê de kurê wî Beşar Esed ket şûna wî. Di seranserê vê heyamê de hem bav hem jî kur destûrê nedan tu dijberîyeka siyasî; bizavên alternatîv ên siyasî yan jî rêlibervekirinên demokratîk pirê caran bi zorê hatin rawestandin. Berî serîhildana sivîl a Adara 2011ê, bêminetkirina herî mezin a li dijî birêvebirîya Hafiz el-Esedî di Sebata 1982yê de li bajarê Hemayê pêk hat. Ji bo nehiştina belavbûna serîhildanê li bajarên din ên Sûrîyeyê, Hafiz Esed heta teslîmbûyîna bajêr 27 roj bê rawestan bajêr dorpêç kir û bimbe kir; Ji wê demê heta niha di bûyera ku bi navê “Tevkujîya Hemayê” tê zanîn de hema hema 20.000-40.000 însan hatin kuştin ku pirranîya wan sivîl bûn. Tevlî ku gelek kes bûyerên Hemayê dijberîya Birayên Misilman a bi birêvebirîya el-Esedî ve girê dan jî, yên din, endamên partîya Komunîst, sendîkayên karkeran û komên cuda yên civatî jî tevlî serîhildanê bûn. Hikûmeta Sûrîyeyê, Hemayê ji bo bêkarîna her çi serîhildanekê ji xwe re wek nimûne bi kar anî û ‘Erebên Sinnî ji serîhildana Hemayê berpirsîyar dît û “tûjîtîya Sinnîtîya ‘Ereb” a heta îro dewam kiriye di nava yên ne sinnî de bû sebebê tirsê. El-Esed, ji civata ‘Elewî ya azbateka Îslama Şî’î ye ku ji sedî 13ê nifûsa Sûrîyeyê ji wan in. Piştî ku Hafiz Esed hat û bû serwer heta vêga, ‘Elewîyên sadiq di hikûmetê de di wezîfeyên ewlehîya herî bilind, îstîxbaratê û eskerî de hatin bicîhkirin. Hafiz Esed, digel ku bi koma ‘Erebên Sinnî ya Sûrîyeyê re têkilîyên divên û strategîk kir jî, gelek komên dînî bi hevdînên xwe re dijîyan. Rasthatina li taxên dînî yên cuda yên wek Fileh, ‘Elewî yan jî Misilman a ku dibû sebebê perçebûnê ewlenebûnê, tiştekî belavbûyî bû. Dema ku li Sûrîyeyê serîhildana sivîl û xwenîşandanên li dijî hikûmetê di Adara 2011ê de dest pê kir, destpêkirina eşkerebûna tingijîna mezhebî ya tarîxî ya xurtbûyî dirêj dewam nekir.

Hikûmeta Sûrîyeyê yekser “Îslamîkirina” dijberîya çekdar hêsan kir û ji bo di nava komên nemisilman de peydekirina rewşeka tirsê ji dibîranîna tevkujîya Hemayê feyde dîtin. Hikûmet, di nava 2011ê de, ji Zîndana Seydnayayê ya bi xerabî tê naskirin, tevlî Sinnîyên şervan ên naskirî yên piştî 2003ê di Şerê Îraqê de şer kirine jî di nav wan de 200 girtîyên ku bi awayê “fûndamentalîstên Îslamî” dihatin naskirin, serbest kir. Hin ji serbestberdayîyan di partîyên dijber ên wek DAÎŞ, Cebhetul Fethul Şam û dijberîyên çekdar ên din de bûn serek. Serek el-Esed û rejima wî li ser tirsên mezhebî leyîst; dîsa û dîsa got ew bi “partîyên Îslamperest ên tûj” ên ji bo bêtirkirina tingijînên mezhebî tev digerin re şer dike. Di encamê de, di şeş salên bi şerî buhurî de, serek el-Esed wek yekane parêzvanê ku kêmanîyên Sûrîyeyê ji tûjîyên ‘Erebên Sinnî diparêze tê gihîştin. Pirranîya kêmanîyên nifûsa Sûrîyeyê ditirse ku eger Esed serwer nînbe dê tûjên Sinnî wan bi dest bixin. Di heman demê de ji ber desteknebûyîna pirranîya ‘Erebên Sinnî, Filehên Sûrîyeyê, ‘Elewî û Misilmanên Şî’î ji bo şoreşa Sûrîyeyê yan jî tevgera bêalî, dîtin ku bi rejima Sûrîyeyê re hevkar in.

Aktorên navneteweyî tingijînên mezhebî hê bêtir kirin. Ji alîyekî ve Rûsya, ji rejima Esedî re hêza hewayî û desteka eskerî û bi awayekî sînorkirî hêzên yekbûnê peyde kir, Îran; tevlîbûna Hîzbûllaha ji alîye Dewletên Yekbûyî ve wek terorîst tê naskirin, tevlî yekîneya ji 5.000 Şî’îyên Îraqê, ji bo destekdayîna rejima Esedî û şerkirina li kêleka wî hema hema yekîneyên Şî’îyên Efxan û Pakistanî yên ji 18.000 kesan hêsan kir. Di vê demê de rikberîya çekdar a di demeka çûyî de ji alîyê ‘Erebistana Si’ûdî û Qeterê ve û niha jî ji alîyê Tirkîyeyê ve destek jê re tê dayîn, di seransera 2016ê de axeke giring û desthilata xwe ji dest dan; lêbelê Hikûmeta Tirkîyeyê, ji bo destekdayîna ji komeke çekdar a bi navê Mertala Feratê ya hem bajarê Cerablûsê hem el-Babê bi paş ve stand hêzên taybet û topavêj şandin û roleka taybet ji bo azadbûna herêmê ji DAÎŞê leyîstiye. Xasma piştî ku Cebhetul Fethul Şam ji bo şikandina dorpêça li ser Wîlayeta Îdlîbê roleka giring leyîst, bibandorbûna dijberîya çekdar li hember partîyên tûj ên wek Cebhetul Fethul Şamê bi paş ket. Cebhetul Fethul Şam, wek Ehrar el-Şamê mehkemeyên Şerî’etê saz kir, li cîhên di binê kontrola xwe pêkhatinên Îslamî yên wekî firotin û vexwarina araqê pêk anî. Komên nemisilman, tê koşîyan ku li cîhên di binê kontrola dijberan de balê nekişînin ser xwe û li gora Misilmanên Sinnî bi zordarîyeke kêmtir dev ji berdana malê xwe kirine. Digel ku DAÎŞ ji sedî 28ê herêma destê xwe ji dest daye jî hê jî keleha xwe ya li Sûrîyeyê diparêze, nemaze jî li payîtexta xwe ya li ber çav, Reqayê. Dema ku Yekbûyîna li dijî DAÎŞê û hêzên Mertala Feratê bajarên Minbîc û Cerablûsê bi paş ve standin, DAÎŞ, di Çileyê Pêşîn ê 2016ê de ji rejima Sûrîyeyê bi biserketinekê Herêma Mîrasa Sîtê ya Dinyayê ya Dezgeha Zanîn, Zanist û Kulturê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO)yê Palmîrayê bi paş ve stand. Kom, -Misilman jî di nav de-her kesê ku destekê nedida bawerîyên tûj în DAÎŞê teror kir û êrîşî wan kir. Îdamên komî, tecawuz, cînayet, îşkenceya li ser sivîlan û kesayetîyên dînî û xerakirina mizgeft û dêran bi raporên ewle bi kitkite hatine bibelgekirin.

Sûrîye, hê jî ji ber rewşên xerab ên mirovahî dilbiêş e. Li gora Staffan de Mîstura-yê Sefîrê Unê, ji 2011ê heta niha hema hema 400.000 kes mirine. Li gora Çileyê Paşîn ê 2017ê, li welatên cîran, di dezgeha Neteweyên Yekbûyî ya multecîyan Komîserîya Bilind a Neteweyên Yekbûyî ya Multecîyan (UNHCR)ê de 4.9 milyon multecîyên Sûrîyeyî yên qeydkirî hene. 6.6 milyon kes li welatê xwe ji warê xwe kirî ne û ji 17 milyon nifûsa Sûrîyeyê bi kêmayî 13.5 milyon ji bo mayîna li jîyanê pêdivî bi alîkarîya mirovahî heye.

Sûrîye, berî 2011ê ji bo komên cuda yên nîjadî-mezhebî xwedanmalekê bû. Hikûmeta Dewletên Yekbûyî li gora jimarên resmî yên Hikûmeta Sûrîyeyê, berî şerî demografîya dînî ya welatî bi vî awayî dinirxîne: ji sedî 87 Misilman (ji sedî 74 Sinnî û ji sedî 13 ‘Elewî, Îsma’îlî û Misilmanên Şî’î), ji sedî 10 Fileh, ji sedî 3 Durzî û li Şamê û Helebê gelek kêm Cihû hene. Di texmînên din ên 2010ê de ev xerabûn heye: 92.8 Misilman, ji sedî 5.2 Fileh, ji sedî 2 azad û hemî komên din ji sedî 0.1î kêmtir.

## Rewşên Azadîya Dînî 2016-2017

***Binpêkirinên Rejima Esedî û Komên bi pê Girêdayî:*** Di şeş salên çûyî yên bi şer de buhurîne de hikûmeta el-Esedî bi pêşîktî taxên ‘Erebên Sinnî lê dijîn, cîhên bazarî, xwandingeh û nexweşxaneyan çawalêhato ji xwe re kir mebest û hê jî dike. Dezgehên mafên mirovan, Neteweyên Yekbûyî, hikûmetên Dewletên Yekbûyî, Fransa û Qralîyeta Yekbûyî li ser binpêkirinên giran û metodîk ên rejimê delîl pêşkêş kirin. Di 2016ê de, Beşa Lêpirsîna Hevapar a

Neteweyên Yekbûyî û Dezgeha Qedexekirina Çekên Kîmyayî (OPCW), rejima Esedî û bi taybetî jî serek el-Esedî ji ber bi emirkirinê bikaranîna çekên kîmyayî bisûc dîtin, eşkere kirin ku ew hemû stokên çekên bi vî cûrê teslîm standine û tune kirine. Rapor nîşan dide ku ji 15 êrîşên kîmyayî yên li Sûrîyeyê 14 ji wan ji alî rejima Sûrîyeyê ve pêk hatine (yek ji wan ji alîyê DAÎŞê ve pêk hat).

Mîlîsên şî'î û 'Elewî, li meydana şerî, ji bo Sepeya Ereb a Sûrîyeyê ya teqezîya biserketinê dike hê jî muttefîqên eskerî yên giring in. Şerê dîsa bidestxistina Rojhilatê Bajarê Helebê şerekî weha bû. Mîlîsên *Şebbiha* yên yên wek Hêzên Parastina Millî tên binavkirin jî bi destdanîna ser, şantajê, revandina mêran û înfaza bêyî mehkeme tên îthamkirin. Hêzên Parastina Millî ya ji alîyê şervanên piranîya wan Şî'î û 'Elewîyên herêmê ne (tevlî jinan) pêk tê, wek modêla Hêza Diberxwedana Besîca Îranê "çeteyên wekî mafyayê" hatin binavkirin. Mîlîsên Şî'î yên din jî di çend salên paşîn de ref bi ref mezin bûn. Li gora jêderên cûrbicûr, hema hema 5.000 şervanîn Hîzbûllaha Libnanê, 5.000 şervanîn Şî'î yên Îraqê û 18.000 şervanên Efxan û Pakistanî di nava Sûrîyeyê de ji alîyê Sepeya Parêzkarên Şoreşa Îranê (IRGC) ve hatin xistin karî. Li gora çendîn jêderan, bi sed hezaran Şî'î li Sûrîyeyê bi dilxwazîya xwe ji bo parastina perestgehên Şî'îyan û di şeran de ji bo destekdayîna serek Esed û şerkirina li kêleka wî xwe qeyd kirine. Jimara şervanên biyanî yên Şî'î yên li Sûrîyeyê jî, wisa kir ku nexasim li Libnanê û li Tirkîyeyê tengijînên mezhebî bêtir bibin.

Rejim, siyaseta bi zorê ji cîhên wan derxistina Mislimanên Sinnî dewam kir. Di sala 2016ê de hikûmeta Sûrîyeyê 125.000 sivîlan ji zoravayên Şamê; Kiswe, Dareya, Wadî Bereda, el-Tel, Xan el-Şeyx, Qudsîya û el-Hameyê bi zorê ji cîhê wan kir û wan biriye Îdlîbê û herêmên din ên dijberan. Di Çileyê Pêşîn ê 2016ê de rejim li Helebê 240.000 sivîlan bi zorê ji cîhê wan kir û piranîya wan şand Îdlîbê, Tirkîyeyê yan jî gundên Rojavayê Helebê. Kesên jicîhkirî bi piranî ji alî siyasî ve li dijî rejima Esedî derdiketin lê hema hema bi temamî li dijî 'Erebên Sinnî jî derdiketin. Raporên cûrbicûr tesdîq kirin ku hikûmet, di cîhên valakirî de Şî'îyên Libnanê û Îraqîyan bi cîh kiriye. Wek nimûne, piştî ku sivîlên herêmê hatin şandin Îdlibê, bicîhkirina bi qasî 300 malbatên Şî'îyên Îraqê li Darîyayê hat pêkanîn.

Tora Mafên Mirovan a Sûrîyeyê da xuyakirin ku rejima Sûrîyeyê di salên 2011-2016ê de ji kuştina 19.594 zarok û 19.427 jin jî di nav wan de 183.827 sivîlan berpirsîyar e. Kom, da zanîn ku 12.486 sivîl bi mirin hatine îşkencekirin û 479 rojnameger û çalakvanên medyaya sosyal û herî kêm 553 wezîfedarên sihhetê jî hatine kuştin. Di 2016ê de 128 êrîş hatiye birin ser cîhên 'îbadetê.

***Binpêkirinên DAÎŞê:*** DAÎŞ, di axa xwe de hê jî azadîya dîn û bawerîyan bi tundî înkar dike; Kom, ji bo parastina hêza xwe, hemû çalakîyên dînî bi rêk û pêk dike. Hemû kesên di –Xwedê giravî- Dewleta Îslamê de dijîn wek jirêderketî, neyar, Ehlê Kîtabê yan jî mu'mînan dabeş dike. Wek nimûne, DAÎŞ, Misilmanên Durzî û Sofî wek jirêderketî dibîne û dixwaze ew dev ji bawerî û kurmên xwe berdin û bibin Îslamîyên Selefî û Cîhadî; eger bêjin na, emrê kuştina wan tê dayîn. DAÎŞê, ji sala 2014ê ber bi nihave, , li Hesiça/Heseke, Reqa û Dêrazorê tirbeya sofî Ezîz î 1000 salî jî di nav de bêtirî 80 tirbeyên Sofîyan xera kir. DAÎŞê di serê vê salê de, serekekî Sofî yê bi navê Şêx Cuma el-Hebîbî kuşt. DAÎŞ, 'Elewîyan û Misilmanên Şîî, ji ber hevkarîya wan a bi rejima Esedî re bi çavê neyarên bi awayekî çalak li dijî Îslamîyetê tê dikoşin li wan dinihêre.

Dezgehên mafên mirovan dan xuyandin ku li Reqqayê bi tenê neh malbatên Ermenî mane û li Dêrazora di destê DAÎŞê de hîç Fileh nemane. Pirranîya Filehan revîyan herêmên di destê Esedî de, Libnanê, Ermenistanê yan jî Rojava. A paşîn, DAÎŞ, -Misilmanên Sinnî- wek “mu’mîn”an dibîne, Selefîbûna Cîhadî ji bo mu’mînbûnê wek şert dibîne. Kom, di 2016ê de, zarokên li herêma DAÎŞê dijîn jî di nav wan de, her kesî mecbûr kir ku ew dersên Şerî’etê li gora bawerîya xwe ya dînî ya tûj temam bikin.

Di nava salên 2011 û 2016ê de dezgehên mafên mirovan bibelge kirin ku DAÎŞê 258 zarok û 213 zarok jî di nav wan de bi kêmayî 1.510 sivîl kuştine. Kom, ji bilî van, 103 zarok û 50 jin jî di nav wan de, 1.419 kes jî girtine. DAÎŞê, bi kêmayî li heşt kesan îşkence kiriye û 26 rojnameger kuştine. Bêtirî van, kom, 19 wezîfedarên sihhetê kuştine û bi bizava revandina dixtorên herêmên dijberan û zorê li wan kiriye ku ew di avahîyên tibbî yên DAÎŞê de kar bikin. Kom, di gerewa fîdyeyê de karê revandina kesan saz kiriye. Li gora komên mafên mirovan, bi kêmayî 45 Fileh di destê DAÎŞê de dîlgirtî ne û ew ê bi tenê di gerewa pereyekî mezin de dikarin werin berdan. Serekên Filehan ên naskirî, tevlî keşeyê Cîzvît ê Îtalî Paolo Dall'Oglio (eger hê dijî) jî di destê DAÎŞê de dîlgirtî ne.

***Komên Dijber ên Çekdar:*** Di seransera sala 2016ê de dijberîya çekdar li hember rejima Sûrîyeyê û hevkarên wê, li Darîyaya Şamê, li taxên el-Wairê yên Bajarê Humsê kelehên xwe yên berê ji dest dan û li Bajarê Helebê û deverên gundî çendîn tişt ji dest dan. Li Sûrîyeyê hema hema 100 komên dijberîya çekdar hene û her yek ji wan li ser rêça xwe ye. Ji ber vî sebebî, dema ku endamên komên çekdar bi kirina sûcekî tên îthamkirin, komeke xuyandî yan temamîya rikberan didin xuyandin ku ew vî sûcî nekirine.

Li cîhên di destê kontrola dijberîya çekdar de ji bo Filehan an jî Mislimanên ne Sinnî hîç siyasetek resmî yan lihevhatî tune ye. Wek nimûne, li deverên di binê kontrola komên dijber ên çekdar de tevlî ku li dijî jîyana Filehan hîç qedexeyîyek tune be jî, a rastî, li deverên dijberan gelek kêm Fileh dijîn. Di şûna vê de, gelek ji wan revîyan deverên ku dewlet wan bi rê ve dibe yan jî ji ber ku ji mayîna li van cîhên bêdenge dilşad nînin welêt bi temamî terk kirin.. Digel ku komên dijber ên çekdar li Sûrîyeyê êrîşên berfireh nabin ser gund û taxên Filehan jî, di Temûza 2016ê de li Helebê komên çekdar ên dijber ên herêmî çendîn taxên li rojavayê Helebê yên ji alîyê hikûmetê ve tên birêvebirin, tevlî taxeke Fileh, bi awayekî giran bimbebaran kirin û tune kirin lê tu kes tê de nemir.

Durzî, bi pirranî li wîlayeta Sweydayê ya başûrê rojavayê Sûrîyeyê dijîn û di nava wan û dewleta Sûrîyeyê de peymaneke ne resmî heye ku ew ê axên wan bi tenê ji alîyê eskerên Durzî ve werin parastin. Hat xuyandin ku 25-30 mêrên Durzî bi destê komên çekdar hatine revandin. Çalakvanên Durzî ji USCIRFê re gotin ku ev revandin bi piranî ji ber şerên ‘eşîrî yên di nava ‘eşîrên Durzîyan û yên Derayê pêk hatine; lêbelê got ku nasnameyeka wan a dînî ya cuda wan bêtir dike bêparastin. Li herêmên di destê dijberîyê de du gundên Durzîyan hene ku ew her du jî li Cebel Sum’eyê ne. Digel ku di sala 2015ê de di nava Durzîyan û yekîneyên dijberên çekdar de li ser deverên xwedîtîya sûbayên rejime şer jî hebûn, ev gund di 2016ê de ji alîye hêzên dijber ve nebûne hedef. Komên dijberîya çekdar li Îdlîbê ji sala 2015ê ve du gundên Şî’îyan Kefraya û Fûayê her wisa dorpêç kirine. Di van gundan de hema hema 40.000 kes dijîn. Dema ku rojhilatê Helebê bi zorê dihat valakirin, ji komên dijber hin eskerên nasnameyên wan nenas, otobêzên ku

gundîyên birîndar dibirin zoravayên Şamê dişewitandin, li ser vî awayî dev ji dan û standinên hevdemî yên bi mebesta şikandina dorpêçkirina Kefraya û Fûayê dê bihata kirin, hat berdan. Di encamê de ji 1.200 Şî'îyên şênî re destûr hat dayîn ew bi awayekî ewle bibuhurin, lê êrîşa dorpêça li Kefraya û el-Fûayê hê jî dewam dike.

Tevlî ku şerên 'Elewî û Sunnîyên Misilman li tevahîya Sûrîyeyê bi awayekî bi rêk û pêk pêk nayê jî, li Hums û Hemayê di nava du koman de şerên dijwar pêk hatin, ji ber ku 'Elewîyên Humsê di destpêka 2011-2012ê de tevlî tevkujîya komî ya Misilmanên Sinnî bûbûn. Di encamê de, tingijînên mezhebî bûn encama nakokîyeka demdirêj. Wek nimûne, di Gulana 2016ê de koma Ehrar el-Şam-a Selefî ya Cîhadî ya çekdar, di nava sînorên Hema û Humsê de li gunde Zarayê 19 'Elewîyên sivîl û yên mîlîs ên çekdar ên destekê didin rejima Sûrîyeyê,tevlî şeş jin jî dî nav wan de hebûn, kuştin. Li seranserê vê devera sînorî di nava Misilmanên Sinnî û 'Elewî de şerên piçûk her car pêk tên.

**Siyaseta Dewletên Yekbûyî**

Bi tenê piştî pênc mehan ku li Sûrîyeyê nakokîya di 18ê Tebaxa 2011ê de dest pê kir, Barack Obama gazî Beşar Esedî kir ku ew dev ji karî berde û di wê gavê de emrekî pêkanînê derxist ku hebûnên hikûmeta Sûrîyeyê yên di selahîyeta mehkemeyên Dewletên Yekbûyî de werin rawestandin. Ev emr, di heman demê de kirina her çi pêkhatineka di nava Dewletên Yekbûyî û Hikûmeta Surîyeyê de jî qedexe kir. Dewletên Yekbûyî di 2012ê de Sefareta xwe ya Şamê girt û di Adara 2014ê de emir kir ku Sefareta Sûrîyeyê û konsolosîyên wê yên li Dewleta Yekbûyî werin girtin. Di Çileyê Pêşîn ê 2012ê de hikûmeta Dewletên Yekbûyî, Yekbûna Neteweyî ya Şoreşger û Hêzên Dijber ên Sûrîyeyê wek nûnerê rewa yê gelê Sûrîyeyê nas kir û di Gulana 2014ê de nivîsîngehên wan ên li Waşîngton-DC û New Yorkê wek wezîfeyên derve yên dîplomatîk nas kir. Encûmena Danûstandinan a Bilind a endamê danûstandinên fermî ya dijberîya li Sûrîyeyê, tevlî dan û standinên Cenevê bû.

Hikûmeta Dewletên Yekbûyî ji 2011ê ve ji bo Sûrîyeyîyên li ser krîza Sûrîyeyê kar dikin û welatên cîran, di mijara alîkarîya mirovî de bêtirî 5.9 milyar Dolarî alîkarî kir. Fonê, destekê da çalakîyên Wezîrîya Derve ya Dewletên Yekbûyî, Ajansa Bipêşveçûna Navneteweyî, Dezgeha Koçberîyê ya Navneteweyî, Fona Alîkarîya bi Zarokan re ya Neteweyên Yekbûyî, Nivîsîngeha Koordînasyona Alîkarîya Mirovahî ya Neteweyên Yekbûyî, Fona Nifûsê ya Neteweyên Yekbûyî, Dezgeha Sihhetê ya Dinyayê ya Neteweyên Yekbûyî û UNHCRê. Di fonê de bizavên ji alîyê Dewletên Yekbûyî ve destek standin, hînkarîya civata sivîl, bipêşvebirina kapasîteya encûmena herêmî, desteka sihhetê û tibbî, projeyên hînkirinê, alîkarîya xwarin-vexwarinê, desteka psîkososyal, rehabîlîtasyona li malê û bipêşvebirina jêderên buhurandina jîyanê hene.

Di Sebata 2016ê de Koma Desteka Sûrîyeyê ya Navneteweyî ya ku Dewletên Yekbûyî hevserekîya wê hilgirtibû, destekê da di seranserê welatî de rawestandina şerî. Çi heyf ku rawestandina şerî bi ser neket û a rastî jixwe ji meha Nîsanê ve xera bûbû jî. Di meha Îlonê de daxwazeke din î Rûsya û Dewletên Yekbûyî ji bo rawestandina şerî peyda bû, ev jî di encamê de têk çû. Di dawîyên sala 2016ê û destpêka sala 2017ê de li li bajarê Astanaya Kazaxistanê di nava Rûsya û Tirkîyeyê de çûn û hatineke din î dan û standineke din î hekemîyê pêk hat. Dan û standinên ku hem dijberîya çekdar û hem jî rejima Esedî tevlî wê bû, ji bo di seranserê welatî de

pêkanîna rawestina şerî careke din bi ser neket. Ji bidawîhatina dema raporgirtinê û pê de, tê pîlankirin ku di dawîyên meha Sebata 2017ê de bi serektîya Sefîrê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî Staffan de Misturayî li Cenevê gaveke din ji bo dan û standinan were pêkanîn.

Yekîtîya li dijî DAÎŞê ya wek Tevgera Biqerarîya Xwebixwe tê binavkirin ji alîyê Dewletên Yekbûyî ve tê birêvebirin û tê de 65 welat hene. Hikûmetên yekîtîyê yên êrîşên hewayî pêk tînin; Awistiralya, Behreyn, Keneda, Frensa, Urdun, ‘Erebistana Si’ûdîyê, Tirkîye, Mîrîtîyên ‘Ereban ên Yekbûyî û Qralîyeta Yekbûyî ye. Yekîtî bêtirî 10.000 wezîfe pêk anîn ku bi kêmayî 6.370yê wî li Sûrîyeyê bû û gelek ji wan ji alî Dewletên Yekbûyî ve pêk hatine. Ji Çileyê Paşîn ê 2016ê pê de, malîyeta tevahî ya operasyonên li dijî DAÎŞê ji 10 milyar Dolaran buhurî. Di Çirîya Pêşîn a 2015ê de Obamayê Serekê wê demê got ku ew ê ji hêzên taybet ên operasyonê 500 kesî ji bo şîretên şerkirina bi DAÎŞê re li hêzên herêmî bikin bi cîh bikin. Yekîtî, bidestxistina Minbîca di sînorê Tirkîyeyê de jî di navê de, di 2016ê de bi ser ket; şerê li dijî DAÎŞê yê li “payîtexta” wê Reqqayê hê jî dewam dike.

Di 17ê Adara 2016ê de, Wezîrê Karên Derve yê wê demê John Kerry beyan kir ku “Êzîdî, Fileh û Misilmanên Şî’î jî di nav wan de, li herêmên di binê serwerîya xwe de kuştina kokî” û “li dijî heman koman li dijî mirovahîyê paqijîya nîjadî û car caran jî li dijî Misilmanên Sinnî, Kurdan û kêmanîyên din pêkanîna sûcan” DAÎŞ berpirsîyar e.

Dewletên Yekbûyî, di sala 2016ê de bêtirî 12.500 multecîyên Sûrîyeyî qebûl kirin. Surîyeyî, eger ji sînorekî navdewletî buhurîbin, di rêya bernameya UNHCRê de dikarin xwe bigihînin bernameya bicîhbûna Dewletên Yekbûyî. Ji bilî van, bi saya bernameyeka xwegihana yekser a nû ya di Sebata 2016ê de dest pê kiriye, ji bo Sûrîyeyîyên ku bi Dewletên Yekbûyî (US) re girêdanên wan ên malbatî hene, ew keys ji wan re hat dayîn ku ew bêyî şandina UNHCRê, yekser serî li hikûmeta Dewletên Yekbûyî bidin. Di biryarnameyeke di Çileyê Paşîn ê 2017ê de, Serek Trump, bicîhbûna multecîyan li Dewletên Yekbûyî bi dirêjahîya 120 rojan rawestand û kirdarîyên lêkolînê di ber çav re derbas kir û di sala Malî ya 2017ê de qarçîya qebûlkirina multecîyên gerdûnî ji 110.000î daxist 50.000î, lê di dawîya dewreya raporkirinê de ev guherîn man li ser biryarê mehkemeyê.

Dewletên Yekbûyî, destekê da şandina rewşa Sûrîyeyê ya Gulana 2014ê ya Encumena Ewlehîya Neteweyên Yekbûyî (UN)ê bo ICCê, lê Rûsya û Çîn vî awayî veto kirin. Tevlî vî awayî, eger şandineke weha çê bibe jî, qanûnên heyî yên Dewletên Yekbûyî bikaranîna fonên ji bo destekdayîna lêkolîn û lêpirsînên ICCê ji alîyê Dewletên Yekbûyî ve zehmet dike